Danasîna Pirtûkan

Berhevkirin: Gerok



Dosya Barzanî, di sindoqa Stalîn ya polayî de.
Lêkolîn
Wezîrê Eşo
Weşanên Êktiya Nivîserên Kurd li Duhokê.
86 rûpel

Pirtûk basî jiyan û kawdanên Barzaniyê nemir û yazde salên ku li Yeketiya Sovyetê borandîn dike. Herwesa basî sedemên çûna wî di gel 500 sed qaremanan û armancên wê koça dirêj û sext dike. Gelek çavkanî jî, bi dirêjî basî wê çûnê û pîlanên dijminan dikin û ka çewan li ber dûrpêçkirin û topbarankirinê, astengên siruştî û derbazbûna rûbarê Aras, xweragirtin û xwe gehandine binecihê. Di wî demî de, rewşa siyasî ya kurdan ya aloz bû û komara Kurdistanê li Mehabadê jî, ji navçû bû, lê bi wê çendê doza porîza gelê kurd, bi cîhanê danenasîn û şiyan pişteyaniyê ji Tevgera Azîdîxwaza Kurdan re peyda bikin. Di serdema Stalîn de, deselata Sovyetê, nehêla Barzanî û hevalên xwe, bi hev re bimînin, hemû ji hev cuda kirin û çi pîte bi rewşa kambaxa wan ne dikir. Her çend Barzanî, berdewam name ji Stalîn re dihinartin û basî rewşa xwe û mirovên xwe dikir, lê çi bersiv nedidanê û doza gelê kurd, di sindoqa polayîn ya rijêmê de, veşartî bû. Lê piştî mirina Stalînî di sala 1953 ê de, rewş baştir bû û Barzanî jî, bi xebat û têkoşîna xwe ya berdewam, şiya doza gelê kurd bi Serokatiya Sovyetê bide qebol kirin û li Moskoyê akincî be û di Ekadîmiya Zanînên Şerî de, bixwîne û pîlanên vegerê û destpêkirina şoreşê darêje.

Ji zarokan re çîrok û ji mezinan re dîrok. Helbest
Jîr Dilovan
Amed. 67 rûpel

Pirtûka Jîr Dilovan ya ku ji helbestên fabl pêk dihê, ji aliyê şaredariya Sûrê ya Amedê ve hat çapkirin û li Bakurê Kurdistanê, li zarokên kurd hat belavkirin. Jîr Dilovan di vê pirtûkê de, çîrokên gelê kurd yên ku ji kûrahiya dîrokê dihên û nirxên hezar salan digirin nava xwe, bi awayek

helbestî nivîsîne û ji zarokan re kirine diyarî.

Di pirtûkê de, 17 helbestên ku ji 17 çîrokan pêk dihên, pend, şîret û qewêtiyên kalikên me yên beriya hezarn salan, radigihîne nifşên nû. Pirtûk bi dîroka fablên kurdî û pêşgotina nivîskar dest pê dike.

Bazê Med; Ferwertîş. Roman
Edîp Bedîrhan
Weşanxana Siyahbeyaz, 2007

Dîroka gelê me, li her çar parçên welatî, di bin erdê û di nav şikeftên asê de veşartiye. Dijminî jî, li ser me serdestî kiriye û her tim bûye asteng li pêşiya derketina dîrokê. Nimûna giring jî, şûnwarên bajarê Heskîfê ye ku dixwazin wê di bin avê de bihêlin? Yekemîn romane ku di derbarê dîroka kurdan ya kevn de, hatiye nivîsandin. Ronahiyê dide ser rewşa civakî, felsefî, olî, aborî û leşkerî ya Medan ku weke pêşiyên kurdan dihên nasîn. Ev roman, bahsa jiyana Medan ya berî zayîna Îsa, di navbera 520 û 523-ê dike. Bahsa serhildanan herî mezin ya Medan di bin rêbertiya Ferwertîş de dike. Di pirtûkê de sedemên serhildana Medan tên ser ziman û şervanên Medan çawa dibin artêşeka mezin ya azadiyê bi awayekî berfireh dihê pêşberî me. Dema mirov dîroka kurdan dixwîne, xiyanet weke ehrîmenekî ku xwe di bin rûyê melayiketan de, veşartiye derdikeve hemberî me. Mîna ku derdikeve hemberî Ferwertîş û Medan. Di vê pirtûkê de, du xetên sîyasî û îdeolojîk ku di nava Medan de ne û bi hev re şer dikin hene. Xetek ronahiyê dide riya azadiyê û ya dni jî, wek dijberiyekî li gel dijminên Medan disekine.

Li hin cîhan roman bi fantazî hatine nivîsandin. Lê ji sedî 70'yê pirtûkê, li ser lêkolîna hatiye amadekirin



3 gav û 3 darek. Roman
Jan Dost
Weşanxane: Avesta 2007, 214 rûpele

Di vê romanê de, ya ku bi helkeftina 82 salîiya serhildana Şêx Seîdê Pîran, sala 1925-ê hatiye weşandin. Romannivîs şopa Mihabadê diajo û bi wî zimanê xwe yê helbestî dîsa tevna serhatî, bûyer û qederên lehengên xwe dirêse. Ew bi tevayî li ser kêlîka berî bi darvekirina nemir Şêx Seîdê kal e û dema berî şoreş dest pê bike û bûyerên ku di nava şoreşê de qewimî bûn. Roman li ser çend beşên sereke(ku nivîskar navê wan kiriye Gav û navê romanê bi xwe jî ji wir tê) tê parvekirin. Roman li ser şeva dawî, di jiyana Şêx Seîdê kal de, salox dide.